

Bidestveanîna mafên neteweyî
yên gelê Kurd di çarçoveya
Îranek Demokratîk û Federalî de

Hejmar: 77
17'ê Çileyê Pêşîn
Buha: 150 Tûmen

agiri

Pîroz be 26ê sermawezê

26ê Sermawezê, roja pêşmerge kurdistanê, roja wan Xebatkarên azadîxwaz û welatparêz yê gelê me ye ku bi salane di pêxema gehîştin bi maf û kerameta gelê xwe de, tekoşînekî birûmet dimeşînin. pêşmerge ew kesê ye ku li hember rizgariya gelê xwe û nîştîmana xwe de, canê xwe dîkin gorî.
Em jî bi hinceta vê roja mibarek pîrozbahiyê ji tev pêşmerge aşîxwaz û gelê kurd bi giştî dîkin.

Desteya Weşana Rojnameya Agirî

Rojnameya panzdehrojî ya siyasî, çandî û giştî

Partiya Demokrat ya Kurdistanê Îranê diweşîne

PKD Îranê Bû Endamê Rêxistina "Geneva Call"



3

Daxuyaniya PKD Îranê, Derheq Azadkirina Kazim Darabî



4

Bi Dawîhatina Çaremîn Festîwala Hêza Pêşmerge Kurdistanê



6

Beşdariya Berçav A Jinan Di Partiya Civaka Demokratîk De




7

WÊJEYA CÎHANÊ



10

Pêşmerge Sembola Keramet, Fîdakarî û Azadiyê



Pîroz Be 26'ê Sermawez, Roja Pêşmerge Kurdistanê

Pêşmerge Ey Sembola Rizgarî, Berxwedanî û Cangorîtiyê, Ey Nîşan û Berjenga Qehremanetî û Mêrxasiyê, Ey Evîndarê Eşq û Azadiyê, Ey Rûgeha Evîndar û Azadîxwazan, Ey Xebatkar û Parêzvanê Maf û Kerametê, Ey Şoreşvanê Aşîxwaz, Ey Xebatkarê Netirs û Mandînenas Roja Te Pîroz, Nav û Pêgeha Te Jî Herweha Li Nav Dil û Li Ser Zaran Be

Peyama Komîsyona Siyasî – Nizamî Ya PDK Îranê, Bi Hinceta 26'ê Sermawezê, Roja Pêşmergeyên Kurdistanê

X elkê azadîxwaz yên Kurdistanê!
Pêşmergeyên mandînenas û
xweştivî!
Beşdarên rê û resma 26'ê
Sermawezê, Roja Pêşmergeyên Kurdistanê!
Hevalên Pêşmerge!

Ji aliyê Komîsyona Siyasî – Nizamî a PDK
Îranê ve pîrazbahiya Roja Pêşmergeyên
Kurdistanê ji we dikim.

Îro roja rêzgirtin ji wan xebatkaraên
Kurdistanê ye ku jiyana xwe ji bo azadî û
rizgariya gelê xwe danîne.

Ew şoreşvanên ku bi bîr û bawer, hizr,
zanist û karîna xwe ji bo xizmetkirin bi gelê
xwe terxan kirine û di hemû warên xebatê
de amade ne. Bi dengê xwe, bi çeka xwe û
bi pênuşa xwe li hember dujminên gelê
xwe de sekinîne.

Roja rêzgirtin ji egîdên leheng ên
Kurdistanê ye, yên ku Kurdistan li ser
pêyên wê ragirtine û çepera xebatê bi
avedanî hêştine. Xevna neyar û dujminên
gelê Kurdistanê bona ji holêrakerina navê
Kurd û Kurdistanê betal kirine.

Îro cejna destkevtên Pêşmergeyên
Kurdistanê ye.

Hevrêyên hêja!

Pêşmergeyên qehreman ên Kurdistanê!

Di serdemê zêrîn ê Komara Kurdistanê û
piştî damezrandina Hêza Neteweyî a
Kurdistanê, erkê wê hêzê parêzvanî ji
Komara Kurdistanê bû. Kurdan ji berê ve
navê pîroz yê Pêşmerge ji bo mirovên
netirs û cangorî bikar birine. Ji wê roja ku
navê Pêşmerge di wêjeya şoreşgerane a
gelê me de, bû kultur, nasname, sembola
xweragirî, berevanî û cangorîtîyê,
Pêşmerge bû baskê bihêz yê gel.

Yekemîn xebata çekdarane a hêza gel,
destbiserdegirtina axirîn nîşaneyê hikûmeta
zordar a Paşayeti, anku şarewaniya
Mehabadê ye, her li wê êrişê de bû ku
yekemîn şehîd pêşkêşê bargeha xelkê
Kurdistanê hate kirin. Gava han, gaweke
giring di bizava rizgarîxwaziya gelê Kurd di
Kurdistanê Îranê de bû. Wan da selimandin
ku vîn û îradeya bihêz û rêxistî a wan
dikare desthilata sepandî û zalim jinav bibe
û parêzvanîyê ji maf û azadiyên xelkê
Kurdistanê bike.

Ji wê demê heya niha, zêdetirî şêst sal ji
xebata behreq û berdeham a hêza
Pêşmergeyên Kurdistanê bi rêberiya PDK
Îranê, derbas dibe. Temenekî dirêj û xwedî
destkevtên mezin e.

Hêza Pêşmerge li Komara Kurdistanê de,
parêzvanê wê Komarê bû û di pêxema
armancên Komarê de cangorîtî kirin. Hêza
Pêşmerge Desthilata Mihemedriza Şah
anîbû lerizînê. Li şoreşa gelên Îranê de
axirîn şunwarê rejîma Şah jinav birin û ji bo



parêzgarîkirin ji destkevtên xelkê
Kurdistanê, li hember rejîma kevneperest a
Melayan sekinîn û ças û pasdar bi çokda
anîn. Xebat û cangorîtî kirin, lê çepera
xebatê bicih nehêlan.

Ji bo rêzgirtin ji xebat û cangorîtîya hêza
Pêşmergeyên Kurdistanê, Komîteya
Navendî a PDK Îranê di pîlînomayê duyem a
piştî kongireya şeşem, biryar da ku roja
26'ê Sermawezê weke roja Pêşmerge were
binavkirin û li 26'ê Sermawezê sala 1363'ê
Rojî, yekemîn cejna Pêşmerge bi awayekî
fermî hate lidaraxistin.

Ji demê ve, hemû salekê xelkê
Kurdistanê û PDK Îranê di vê rojê de, rêz û
pêzanîyê ji hewl û tekoşîna egîdên xwe ên
xebatkar digirin û li hember fîdakarî,
xweragirî û cangorîtîya wan bi emegdariyê
ve serê xwe diçemînin.

Îro di demekê de rêz ji xebata Pêşmerge
tê girtin ku destkevtên wan ji hemû
demekê zêdetir û berçavrtir in.
Pêşmergeyên Kurdistanê li doma xebata
bêrawestan a xwe de, bala bîr û raya giştî a
cîhanê, kom û civatên mirovdost û hetanî
beşeke berbiçav ji hikûmetên demokrat ên
cîhanê bo maf û daxwaziyên xelkê
Kurdistanê rakişandine. Xebata tevî fîdakarî
a Pêşmerge, dujminên gelê Kurd ji vê
çendê têgihandin ku gelê Kurd bi serkut û
tepeserkirinê teslîm nabe û egîdên wî gelî
hemû demekê amade ne ku parêzvanîyê ji
hebûn û mafên xwe bikin.

Rohn û eşkere ye ku em nikarin di rê û
resmeke wiha de, xebat û tekoşîna
Pêşmerge binirxînin, lê em dê rêz û
hurmetê jê bigirin, çunku hewl û xebata
wan destkevt û encamên girîng ji bo gelê
Kurd lişûn de bûne. Bila ew şanaziye bikin
ku partiya wan mezintirîn û bibawertirîn,
xwedî rêxistînek tekûz, diplomasi û
pêwendiyê berfirêh û ragihandîneke
bihêz û nûjen e ku evana hemû di encama
xebata wan de bidest hatine.

Hevalên hêja!

Dema ku em ji dujminê sereke yê hêza
Pêşmerge anku Komara Îslamî ya Îranê
dinihêrin, bi rohnî ji me re eyan dibe ku ew
rejîme niha zêdetir ji hemû demekê din
lawaz û bêhêztir û ketiye ber zext, gazin û
lomeyên cîhana nûjen.

Rejîma Komara Îslamî bi hewlên xwe
derheq terorîzma navnedewletî, maytêkirin
û çêkirina arîşeyan di kar û barên welatên
cîran, binpêkirina mafê mirovan, kiryarên
dijî mirovî û fîdakirina berjewendiyên gelên
Îranê, hewlê bona bidestveanîna çekên
Etomî dide. Eva di demekê de ye ku ew
rejîme ji hemû demekê zêdetir di bin zext û
givaşa navneteweyî de ye.

Em dizanin ku Komara Îslamî bi
pawankirina desthilatê, bi meşandina
serkut, tepeserkirin û gefxwerin li hember
her bizaveke azadîxwazane kariye ku
hiloşîna xwe paşde bixe, lê ev çende nikare
li hember îradeya gelên Îranê de dom bike
û direng yan zû mehkûm e bi jinavçûnê.

Pêşeroja xebata hêza Pêşmergeyên
Kurdistanê ji bo azadiyê rohn û eşkeretir ji
hemû demekê ye.

Bihiloşe rejîma kevneperest a Komara
Îslamî ya Îranê!

Bijî Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê,
avakerê Hêza Pêşmergeyên Kurdistanê!

Silav li Pêşmerge, baskê bihêz yê gel!

Serkeve bizava neteweyî – demokratîk a
gelê Kurd bi rêberiya PDK Îranê

Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê

Komîsyona Siyasî – Nizamî

26.09.1386

17.12.2007

Bûş: Rejîma Îranê Herweha Xeternak E



Serokkomarê Amerîkayê ragihand ku
rejîma Îranê herwisa xeternak e û ger
destê wê bi teknolojiyê meyandina
Uraniyomê bigihîje, dê xeternaktir jî bibe.

Wî got divêt Îran rastiyan derheq
bernameyên navkî yên xwe eşkere bike.
Em bawer in ku Îran xwedî bernameya
silahên Hesteyî ye û divêt bi civaka cîhanî
re bêje ku çima li dû wê bernameyê de ye.

Herweha got: Rejîma Tehranê divêt
bersiva Ajansa Vejena etomî jî bide ku bo çî
bernameyên navkî yên xwe ji vê Nawenda
ser bi Rêxistina NY veşartîye.

Partiya Demokrat A Kurdistana Îranê Bû Endamê Rêxistina "Geneva Call"



Roja 04.12.2007'an, PDK Îranê piştî wajokirina rêkevînameya "Geneva Call"ê, weke endam di vê rêxistinê de hate wergirtin.

Di vê derheqê de roja 04.12.2007'an, şandek ji PDK Îranê bi serokatiya birêz **Mistefa Hicrî**, Sekreterê Giştî, li Jinevê tevî bersivekê "Geneva Call"ê hevdiştin pêk anî û di rê û resmekê de belgeya endambûna PDK Îranê di rêxistina han de wajo kir.

Li gor peymannameya han PDK Îranê xwe ji veguhastin û çandina mayînen dijî mirov diparêze û saziya "Geneva Call" jî divêt derheq pirsê han hevkarîyê tevî PDK Îranê bike.

Rêkevîname demjimêr 2:30'ê piştî nîvro, li hola Alaboma di navbera şanda PDK Îranê û bersivekê Kantona Jenevê û bersivekê saziya han de hate îmzekirin.

Hêjayî gotinê ye ku hola Alaboma yek ji holên herî bi nav û deng a bajarê Jinevê ye ku tê de civînên aştiya piştî şerên navxweyî

ên Amerîkayê birêve çûne. Her wiha yekemîn peymana navneteweyî a mafê mirovan jî piştî şerê duyem ê cîhanî di vê holê de hatiye wajo kirin.

Peymannameya han ji aliyê 34 saziyên nedewletî hatiye îmzekirin û PDK Îranê jî 35'emîn sazî ye ku vê rêkevînameyê wajo dike.

Di peymannemeyê de ku bi peymannameya Otava hatiye nasîn û di sala 1996'an, li Kanadayê pêk hatiye, 156 welatên cîhanê rêkevînameya mifawernegirtin ji mayînen dijî mirov wajo kirine. Lê heya niha jî rejîma Komara Îslamî ya Îranê peymannemeyê han îmze nekiriye.

Hêjayî gotinê ye ku Rêxistina "Geneva Call", saziyek nedewletî ye û di bin çavdêrî û piştevaniya Neteweyên Yekbûyî de dixebite û navenda wê li Jinevê ye.

Saziya han heyamê 5 salan e ku tevî PDK Îranê pêwendî heye.

Peyama Sekreterê Giştî Yê Rêxistina "UNPO" Yê, Ji Bo Birêz Mistefa Hicrî

Piştî îmzakirina Peymannameya "Geneva Call"ê ji aliyê PDK Îranê û endambûna PDK Îranê di saziya han de, Sekreterê Giştî yê rêxistina "UNPO"yê, peyameke pîrozbahî ji bo birêz **Mistefa Hicrî**, Sekreterê Giştî yê PDK Îranê şand, eva jêrîn jî deqa peyamê ye:

Birêz Mistefa Hicrî

Rûmet û serfiraziyeke mezin bi min hate bexşin ku bi nûneratiya rêxistina Gel û Netewên bê nûner (UNPO)yê, bi hinceta îmzakirina peymannameya qedexekirina bikaranîna mayînen dijî kesa, ji aliyê Partiya Demokrat, pîrozbahiyî û keyfxweşiya xwe pêşkêşî cenabê te yê birêz bikim.

Herwek piraniya endamên Rêxistina (UNPO)yê, tevî tirsê mayînen çandî ber bi rû ne, UNPO bi tundî piştevaniya xwe ji



kampayna qedexekirinê dike û bi eşkere bi ji nav birina ew cihwarên mayînen dijî kesa di nava civakê de xebatê dike. Lewra dema ku min ev nûçeyê bihîst, ez gellek pê keyfxweş bûm û çavniherê bicîgihandina soz û peymanên we ên derheqê vê pirsê di pêşerojê de me.

Tevî sijas û pêzanînen xwe

Mornêv Basdaçin

Sekreterê Giştî yê UNPO'yê

Birêveçûna Şevbêreka Heyran, Lavik û Miqamên Kurdî Bi Hinceta Pîrozkirina 26'ê Sermawezê, Roja Pêşmergeyên Kurdistanê

Di şevbêrkek payîzî de, evindarên xebat, mafxwazên demokrat, xebatkarên xweragir ên Kurdistanê, Pêşmergeyên hunermend ên rêya tekoşînê berbi pêşvaziya 26'ê Sermawezê (16'ê Çileyay Pêşîn), Roja Pêşmergeyên Kurdistanê çûn.

Roja pêncşem, 13.12.2007'an, rê û resma pêşwazîkirin ji 26'ê Sermawezê, di bin navê "Şevbêrka Miqam, Lavik û Heyranên Kurdî", bi amadebûna beşek ji endamên Deftera Siyasî, Komîteya Navendî, Kadro û Pêşmerge û malbatên wan ên birûmet, di yek ji binkeyên Deftera Siyasî de hate lidarxistin.

Rê û resm bi xwendina peşanek di bin navê "Emin Demokrat im" (Ez Demokrat im), ji aliyê **Çiya Hicrî** ve, dest pêbû.

Şevbêrk bi gotina Lavik, Miqam û Heyranan ji aliyê hunermendên dengxweş, **Şerelî Temûyî, Hesên Mehmûdî û Qazî Resûlzade, Cemşîd Pîrî, Hîwa Mihemedî, Xolam Fatihî, Firêdûn Ezîmî, Piştivan Kakil, Ziyab Sadiqî**, dom kir.

Dûre girûpa davetê Agirî ku ji komek keçên nûciwan pêkhatibû, bi nimayîşkirina çend curên govendê re û resm xemilandin û di cewek teji ji xweşî û şadî de rê û resim bi dawî hat.



Daxuyaniya Deftera Siyasî A PDK Îranê Derheq Azadkirina Terorîst Kazim Darabî



Serencam piştî heyamekê li ser belawbûna deng û basên li ser azadkirina **Kazim Darabî**, yek ji

tawanbarên terora Mîkonosê li bajarê Berlîna Almaniyayê, roja 19^ê Sermaweza 1386^ê (10^ê Desambara 2007'an) navhatî ji aliyê dewleta Almaniyayê ve serbest hate berdan û ber bi Tehranê ve hate şandin û ji aliyê rayedarên Komara Îslamî ve bi germî hate pêşwazîkirin.

Her çend ku Kazim Darabî bi rûyekî bi wê yasayê hate azadkirin ku pê hatibû girtin, lê kiryara terorîstî a naskirî bi Mîkonosê, ewqas mirar û rola Darabî jî li wê pilana terorîstî de hinde eşkere bû ku rengê wê yekê nade ew ji avansa yasayî bimifah be anku piştî qetandina du ji sê ya mideha zîndaniya xwe radestî welatê wî bihê kirin, bona wê ku midehê mayîna zîndana xwe li Îranê de biqetîne.

Diyare hikmê dadgeha naskirî a Mîkonosê cuda ji encamderên wê kiryara terorîstî, rêberên payebilind yên Komara Îslamî a Îranê jî weke biryarderên vê terore bi raya giştî a cîhanê da nasandin û ew mehkûm kirin. Lewra veqerandina Kazim Darabî bo hambêza rêberên terorîstperwer û afirînerên terora Mîkonosê ne tenê nabe sedema wê ku Darabî heyamê mayî yê hukmê de li girtîgehên Îranê de biqetîne, belku herwek hate dîtin ji aliyê rejîmê ve bi germî hate pêşwazîkirin û helqe gul xistine sukra wî. Bê guman paye û pileyên bilindtir, îmkanat û îmtiyazên taybetî jî dê jêre bihên diyarîkirin.

Ne siruştî xuya dike ku rojavayî ji aliyekê banga dijî terorîzmê diqirînin û li her kun û kuncê ve cîhanê de li dû dewsa terorîstan digerin, ji aliyê din jî terorîstekî naskirî û mehkûmkirî yê naskirîtirîn rejîma piştevanê terorîzmê ku li destê wan de ye, serbest berdidin, ew newekhevî û dijberî çawa tê pasawdan,

carê ne ron e!?

Ya ku di vê derheqê de balkêş e, eva ye ku roja azadkirina Kazim Darabî, Roja Cîhanî a Mafê Mirov bû û ger bê nirxandin û heta bi helkewt jî bibe, eva henek û rîşekirin bi mafê mirov û roja cîhanî ya mafên mirovan e.

Rojekê ku cîhan tê de rêz ji mafên mirovan digire û li gellek welatan de rê û resmên taybetî jêre tê girtin û pûte û girîngiyek zaf jêre tê danîn.

Eşkere ye ku azadkirina Kazim Darabî ne ji girîngî û dîrokîbûna hikmê dadgeha Berlînê û biwêrî û serbixwebûna Qazî(Dadvan) yê wê dadgehê kêma dike û ne jî şermezarî û riswakirina rêberên Komara Îslamî a Îranê û biryarderên terora Mîkonosê kêmreng dike, ji ber ku hikmê vê dadgehê bo heta heta mora riswayî a terorîzma dewletî kutaye eniya pîs û mirar rejîma terorîst û terorîstperwera Komara Îslamî paqij nabe.

Gihîştina Kazim Darabîyê terorîst bi Tehranê û awayê pêşwazîkirina Komara Îslamî ji wî terorîstî, carek din jî terorîstbûna vê rejîmê û rêzgirtina ji terorîstên elimandî û destperwerdeyê xwe eşkere dike û vê rastiye jî raya giştî a cîhanê re eyan dike ku hambêza vê rejîmê bo terorîstên herî naskirî jî vekirî ye.

Kazim Darabî ne tenê neçar bi bihorandina heyamê mayî yê zîndana xwe li Îranê nahê kirin, belku zirar û ziyarên 15 sal zîndaniya li Almaniyayê jî dê jêre bihê dayîn û pile û payeyên nû dê jêre bihê diyarî kirin û dîr jî nine ku li heyamê mayî yê zîndana xwe ew wekî nûnerê rejîma Komara Îslamî li kom û civînên rejîmê tevî welatên rojavayî bi taybet Almaniyayê de bo henek û tiranekirin bi xebata dijî terorîzm a rojavayîyan de beşdar be.

Partiya Demokrat a Kurdîstana Îranê tevî sipasiya dubare ji qaziyên dadgeha Berlînê û tekoşîna parêzeran, azadkirina Kazim Darabî bi gavek dilxweşker bo terorîstan û piştevanên terorîzmê dizane û pênxweşbûna xwe di vê derheqê de eyan dike, ji ber ku gavên bi vî awayî tevî xebata dijî terorîzmê hevrik û dijber e.

PDK Îranê
Deftera Siyasî
20.09.1386^ê Rojî
11.12.2007^ê Zayînî

Di Roja Cîhanî A Mafên Mirovan De, Bikujê Rêberên PDK Îranê Hate Berdan



Kazim Darabî, yek ji tawanbarên terora li Mîkonosê û qatîlê **Dr. Sadiq Şerefkendî** û hevalên wî,

roja 10.12.2007'an, di Roja Cîhanî a Mafên Mirovan de ji aliyê dewleta Almaniyayê hate berdan û radestî Komara Îslamî a Îranê hate kirin.

Darabî û Ebas Rahil, yek ji rêberên din ên terora li Mîkonosê bi sûça terorkirina 3 kes ji rêberên PDK Îranê û xebatkarekî opozîsyonê **Nûrî Dêhkurdî** ji aliyê Dadgeha Berlînê ve bi cezayê girtîgehê yê heta hetayî hatibûn mehkûmkirin.

Ajansên Nûçeyan ên Almaniyayê dan zanîn ku Ebas Rahil terorîstê Lubnanî pêncşemîya borî hate berdan û ji bo Îranê hate şandin.

Li gorî qanûnên Almaniyayê ew tawanbarên ku 15 sal ji biryara girtina wan di wî welatî qediyabe, bi wî mercî ku dema din a cezayê xwe li girtîxaneyê welatê xwe de biqedînin, radestî welatê xwe tên kirin.

Lê PDK Îranê û malbatên şehîdên Mîkonosê û çalakên mafê mirovan li ser vê baweriyê ne ku ji ber vê çendê ku Kazim Darabî û Ebas Rahil bi fermana rêberên Komara Îslamî terora li Mîkonosê, ji aliyê vê rejîmê ve ne tenê nabe bihên bendkirin, belkî dê werin xelatkirin jî.

Hêjayî gotinê ye ku li gor biryara Dadgeha Berlînê, ev yasaya dewleta Almaniya, Kazim Darabî û Ebas Rahil bi xwe nagire û berdana berwext a wan du terorîstane vê şik û gumanê xurt dike ku di vê derbarê de di navbera Almaniyayê û rejîma komara Îslamî a Îranê de lihevkerin çê bûye.

Koma Navnetewî A Parastina Mafê Kêmaniyan: Tirkîyê Mafê Kêmetewa Binpê Dike

Koma Navnetewî a Parastina Mafê Eqlîyetan, navenda wê li paytextê Îngîlistanê, li Londonê ye. Bi rojnamevan, hiqûqnas û kesên nasdar li ser pîrsa kêmetewan kûr dibe, li ser mafê wan zaniyariyê berhev dike û li ser rewşa wan raporên amade dike.

Komê berî niha li ser Tirkîyê raporek di bin sernivîsa "Gerek ji bo wekhevîyê: Kêmeteweyên li Tirkîyê" belav kir. Di raporê de tê qalkirin ku, zîmanê eqlîyetan di jiyana polîtîk û xîzmetên fermî de ji ber qedexê, nikare bê bikaranîn. Di kitêbên dibistanan de li ser wan zaniyariyên weke berê, yê qalip girtî heye.

Mafê kêmetewan li derveyî peymanan Lozanê hate hiştin. Bi zîmanê eqlîyetan, di dibistanan de û di medyayê de bikaranîn, qedexa ye û ew nikarin mafê xwe yê olî baş bikaribînin. Polîtîkaya ji holê rakirina zîman, çand û olê tê bikaranîn. Ji bo perwerde û kirina polîtîkayê tenê ji tirkî re tehemul heye.

Zîmanê kêmetewan di jiyana polîtîk û xîzmeta fermî de nikare bê karanîn, qedexa ye. Kitêbên perwerdê li ser kêmetewan zaniyariyên nerast belav dikin. Li dijî vê şaşiyê rêyek tune ye ku mirov pîrsê bibe dadgehê.

Di hilbijartinan da baraja ji % 10 heye. Bi vê yekê re li ber kêmetewan tê girtin ku ew nikaribî cihê xwe ji meclîsê de

bigirin.

1934'an û virve pêşketinê çêbûne
Di sala 1934'an de li aliyê Tirkîyayê êrîş birin ser cihûyan. Di 1949'an de navên gundan bi qanûnekê tê guhertin û dibin bi tirkî. Di 1955'an de li Stenbolê êrîşê dibin ser kesên nemisilman. Di 1982'an de mafê bîngêhîn yê mirovan hate sînorkirin û bi qanûna nû perwerdeya olî hate danîn. 1991 Parlamentera kurd Leyla Zana di Parlamentoyê de bi kurdî diaxîfe. Paşê ew û sê Parlementerên din têne girtin û bi 15 sal hepsê hate cezekirin. Di 1992'an de 20 hezar leşkerê tirk li hemberî PKK'ê operasyonê dike û ew derbasî herêma kurda dibin ku, li wir ewlekarî heye. Di 1994'an de DEP tê girtin.

Di 2003'an de meclîsê hişkiya li hemberî zîmanê kurdî nerm kir. Lê mirov nikare navên kurdî li zarokên xwe bike. Dadgeha Qanûna Bîngêhîn, Partiya HADEPê da girtin. Di 2007'an de Serleşkeriya Giştî a Tirkîyê bi beyana xwe anî zîmên ku, kesên li dijî dîtina "kêf û serbilîndî ji wî re ku bêje, ez tirk im" be, ew neyarên Komara Tirkîyê ne û dê herdem neyar bêne dîtin. 2007 Şaredarê Surê Abdullah Demirbaş ji ber sedema xîzmeta xwe a pîzîmanî di belediyê de, ji kar hate dûrxistin û meclîs hate feskîrin.

Zarathustra News

Qezafî: Dewletbûn Mafê Gelê Kurd E

SErok Komarê Lîbyayê, Muemmer Qezafî ku ji bo hevdiîtinê fermî çûye Fransayê, li wir bi nûnerê hikûmeta herêma Kurdistanê li Almanyayê, **Dilşad Barzanî** û sandeyek ji Kurdistana azad re rûnişt.

Qezafî di hevdiîtinê de careka din piştgiriya xwe bi gelê kurd re diyar kir û got; **Li ser meseleya piştgiriya min a ji bo avabûna dewleteke kurd, gelek rexne li min tînin girtin, heta ji min re dibêjin tu ji kurdan zêdetir daxwaza dewleta kurdî dikî, tu daxwaza dewleta kurdî dikî lê partiyên kurdistanî, daxwaza federaliyê dikin.**

Serokê Lîbyayê bi berdewamî got; **Qenaeta min bi edaleta kurd heye lewma hertim û dema şoreşa Lîbyayê heta îro helwesta min neguheriye li hember kurd û gelê Kurdistanê. Min her piştgiriya we kiri ye.**

Qezafî dewletên rexne lê digrin ji binav kir û got; **Tirkîye, Suriye û dewletên din bi dijwarî rexne ji me li ser helwesta me ya li hember**



kurdan girtine, lê min gotiye û dibêjim gelê kurd ku li ser axa xwe dijî, wek gelê din mafê diyarîkirina Çarenivîsa xwe heye. Berevajîya xelkê ku tîrsa wan ji avabûna dewleteke kurd heye û wek xeter bi nav dikin, bi raya min avabûna dewleta kurd qet ne xeter e û mafê gelê kurd e çimkî li ser erd û ava bav û bapîrên xwe dijîn, axa kesî jî dagîr nekirine.

Weke tê zanîn Qezafî di salên 1970-1980yî de ji eşkere piştgiriya dida tevgera azadîxwaz ya kurd û li her derê jî digot; mafê kurda jî heye ku dewleta xwe ava bikin

Şiroveya Peyvên Siyasî



Berhevkar: Omîd Esxeran

Konfederasyon (Confederation)

Konfederasyon ji peyva Latîni a (Confederation)ê ku tê wateya kom û yekîti, hatiye wergirtin. Sîstema han bi piştgîrêdan bi peymanek navnedewletî tê holê ku di navbera

hinek dewletan ji bo bîdestveanîna hin armancên diyarîkirî tê girêdan. Li gor peymanan han, destyêk hevbeş ji bo bîdestveanîna armancên diyarîkirî tê pêkanîn. Dewletên endam di konfederaliyê de, serweriya derve û navxweyî a xwe diparêzin, lê di asteke diyarîkirî de, dev ji hin azadî û desthilatên xwe ji bo desteya hevbeş ber didin. Dewletên endam daxwaz ji desteya han dikin ku hewlê bona bîdestveanîna armancên ku di peymanan konfederaliyê de li ser wan hevhatine, bide. Ji armancên han em dikarin qala parastina serbixweyîya dewletên endam, qedexekirina şer û berevanîkirin ji berjewendiyên siyasî û aborî bikin. Desteya konfederal weke dewletek nahê hesabandin ku li serweyî dewletên endam be, belku erkê wê tenê darêtina siyaseteke giştî ye di çarçoveya wan desthilatên ku jêre hatine diyarîkirin. Desteya han biryarên xwe bi hev dengî dide û divêt biryarên han ji aliyê welatên endam ve werin çîbicîkirin.

Em dikarin armancên yekîtiya konfederal di van çend xalên jêrîn de diyarî bikin:

1. Dewletên endam serbixweyîya navxweyî a xwe diparêzin, lê di pêwendiyên derve de girêdayî siyasetek giştî a konfederal in.

2. Di asta navneteweyî de, konfederalî û destyên hevbeş xwediyê tu serbixweyîyekê ninin û nikarin desthilatek rasterast bi ser hevweletiyên welatên endam de bimeşînin.

3. Her yek ji welatên endam mafê wê çendê hene ku li gor pîrensîp û pîvanên giştî ên şer, dest bavêjin şer ku li dema rûdana şerekî wiha de, şerê han weke şerek navxweyî nahê zanîn, belku bi şerek navneteweyî tê hesabandin.

4. Li gor yasaya giştî a navneteweyî, her dewleteke endam di konfederaliyê de, li hember kiryarên çewt ên hevweletiyên xwe berpîrsiyariyek navdewletî dike ser milê wan.

Dewletên Yekgirtî ên Amerîkayê, di heyama salên 1778 – 1787'an de, bi awayeke konfederasyonê birêve diçû, welatê Swîsê ku ji 22 kanton(canton)an pêkhatiye binav konfederalî ye, lê bi awayê federalî birêve diçe, welatê Almanîya û Holendayê jî berê bi awayek konfederalî birêve diçûn.

Li Şîbata sala 1958'an de ji Yekîtiyê Konfederalî a bi navê " Yekîtiya Ereb a Haşimî" di navbera Îraq û Urîdîne de hate pêkanîn ku gelek dom nekir.

Hin caran jî peyva han ji bo yekîti û rêxistinên civakî, siyasî û aborî tê bikaranîn.

Rapora Hevdîtin û Kar û Çalakiyên Birêz Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî Yê PDK Îranê Li Welatê Swêdê

Sekreterê Giştî yê PDK Îranê, birêz **Mistefa Hicrî**, bi awayekî fermî ji aliyê rêxistina **"Geneva Call-**


Bangeşeya Geneva"ê bo "Genev"ê hatibû gazîkirin.

Di vê sefera siyasî de ku li roja 03.12.2007'an heya 11.12.2007'an dom kir, birêz Mistefa Hicrî hevdîtin tevî navend û sazîyên cur bi cur ên civata Navneteweyî û Swîsî pêk anî, ku emê di vê raporê de bi kurtî bas ji wan hevdîtinan bikin.

Roja 03.12.2007'an birêz Mistefa Hicrî di yek ji holên rêxistina Neteweyên Yekbûyî de li "Genev"ê peyamnemeya qedexekirina mayînên dijî kesan îmza kir û PDK Îranê, bû endamê rêxistina "Geneva Call"ê

Roja 05.12.2007'an, Mistefa Hicrî Sekreterê Giştî yê PDK Îranê, tevî **Xosrow Ebdulahi**, berpirsê beşa pêwendiyên PDK Îranê li derveyî welat û **Ako Elyasî**, nûnerê PDK Îranê li welatê Swîsê, hevdîtin tevî berpirsê Komîsyona Mafê Mirovan a ser bi Neteweyên Yekbûyî re pêk anî.

Roja 05.12.2007'an, birêz Mistefa Hicrî, tevî berpirsên Komîsariyaya Bilind a penaberên ser bi rêxistina Neteweyên Yekbûyî di navenda sereke a vê Saziyê di



"Genev"ê de hevdîtin pêk anî.

Roja 06.12.2007'an, birêz Mistefa Hicrî li welatê Swîsê, seredana binkeya sereke a Partiya Sosyal Demokrat a wî welatî kir ku ji aliyê birêzan **Hans Yorg Fêhr**, Sekreterê Partiya han û **Pêtêr Hûg**, berpirsê Pêwendiyên Nawneteweyî ê Partiya Sosyal-Demokrat ve bi germî hate pêşwazîkirin.

Herwiha roja 07.12.2007'an, birêz **Hûbêrt Tisûkêndêrn**, Sekreterê Giştî yê Partiya Kesk a Swîsê, di cihê kar û xebata xwe de, pêşwazî ji birêz Mistefa Hicrî kir.

Birêz Mistefa Hicrî, roja 10.12.2007'an, seredana Wezaretê kar û barên derve yê

welatê Swîsê kir ku ji aliyê karbidestên Wezaretê han ve bi germî hate pêşwazîkirin.

Roja sêşem, 11.12.2007'an, **Kiristof, Pilate**, rojnamevan di beşa Rojhilata Navîn de di rojnameya kevin û pirtiraj a **Noyezurizêr Tisotang** de li welatê Swîsê, hevpeyvîneke rojnamevanî tevî birêz Mistefa Hicrî derheq dîroka xebata PDK Îranê, siyaseta û rayên PDK Îranê li pêwendî tevî pirsên cur bi cur ên Kurdistan, Îran û cihanê pêk anî.

Hêjayê gotinê ye ku birêz Mistefa Hicrî, di hevdîtin û seredanên xwe tevî navend û rêxistinên cur bi cur ên civata navneteweyî û swîsî de, li ser mijarê weke bînpêkirina mafê mirovan li Îranê û Kurdistanê, zext û givaşên rejîma Komara Îslamî a Îranê li ser xelkê sivîl, azadîxwaz, xwendekar, jinan, ciwanan û giştî çîn û qatên Îranê, bi taybetî xelkê Kurdistanê rewşa nebaş a koçberên Kurdên Îranê ên akinciyê welatê Turkiye, Îraq û Kampa Elkeramê endambûna PDK Îranê di "Geneva Call"ê. Berfirehtir kirina têkilî û pêwendiyên di navbera PDK Îranê û sazi û partiyên mirovhez û azadîxwaz, destavêtina rejîma Komara Îslamî a Îranê di kar û barên welatên cînar, weke Îraq, Felestîn, Lubnan û ... axivî û guhertina bir û rayan kirin.

Rê û Resma Dawîhatina Çaremîn Festîvala Hêza Pêşmergeyên Kurdistanê

Beşa amozîşîya Hêza Parêzgarî îsal jî herwekî salên berê bi hevkarî û piştevaniya komîsyona Siyasî-

nizamî, çaremîn festîvala salaneya xwe di bin dirûşma **Pêşmerge, mexeldarê hizr û kirdarê serdem e**, lidarxist û 4'mîn moma temenê wê, bi armanca pêgihandin û perwerdekirina xebatkarên biemeg yê Partiyê teyisand. Ew festîvale taybet bû bi 26' sermawezê, roja pêşmergeyên Kurdistanê û bilindragirtina vê roja mezin. Festival li du beşên sereke yê Siyasî, Hunerî û werzişî pêkhatibû ku roja îne 2'ê Sermaweza 1386'an de destpê kir li 10'ê Sermaweza 1386'anbidavî hat.

Hêjayî gotinê ye ku rêûresma dawîhatina festîvala 4'mîn ya hêza Parêzgarîyê roja 10.12.2007'an, li binkeya Deftera Siyasî a PDK Îranê, bi beşdara endamên Deftera Siyasî û Komîteya nawendî, hejmarek zaf ji Kadro û Pêşmergeyên partiyê, bi xwendina sirûda neteweyî a "Ey Reqîb" û deqîqeyek bêdenî ji bo canê paqij ê şehîdên Kurdistanê dest pêkir.

Piştê peyama siyasî a Festîvalê ji aliyê yek ji kadroyên hêza Parêzgarî a PDK Îranê hate pêşkêşkirin.

Piştê rapora beşa fikrî- siyasî a festîvalê hate pêşkêş kirin. Dûre pexşanek bi navê



pêşmerge, ji aliyê ke Pêşewa Rezayî ve pêşkêşî beşdaran hat kirinê. Herweha her du hunermendên pêşmerge, Xolam Fatihî û Azad Mistefapûr bi dengê xweş û zelal yê xwe coşek mezin dan rêûresmê.

Di beşa din a festîvalê de, ew Kadro û Pêşmergeyên ku di kêberkêyên festîvalê de serkevtin bi dest xistibûn, hatine xelatkirin.

Hêjayî gotinê ye ku rê û resm di nava govend û xweşîya beşdaran de bidavî hat.



Beşdariya Berçav A Jinan Di Partiya Civaka Demokratîk De

Çinûr Qadirî

Doza jinan di cihana nûjen û pêşkevtî a îro de weke dozeke navnetewî û pirsêke girîng a civakî – siyasî tê hesibandin. Asta zêde a beşdariya

jinan di warên civakî, siyasî, çandî, aborî û... di civakê de nîşaneya pêşkevtina wê civakê ye. Çimku civaka han ji hêz û pitensiyêla nivîya civakê mifah wergirtiye û derheq vê pirsê, bi awayekê paşverûyane nafikire. Ji ber ku birkirinê han dibê sedema dabêşbûna civakê bi du destyên cuda û dijî hev. Lê di civakên pêşkevtî de xelk bi başî dizanin ku heke jin di kar û barên cur bi cur ên vê civakê de bi awayekî çalak beşdariyê nekin, ew civak dê tûşî arîşeyan bibe û civaka han ne civakeke nûjen û kemilî ye. Em jî weke netewa Kurd divêt bihagiraniyê bidin vê pirsê û ger em bixwazin ber bi nûjenbûn û pêşkevtinê, gavan biavêjin, divêt ku di eniya wekhevîxwazî û wekhevîya jin û mêran di civakê de cih bigirin. Rewşa jinên kurd li her parçeyêkê Kurdistanê bi awayekê ye. Piştî serhildana sala 1991'an, li Kurdistanê Îraqê û azadbûna vê beşa Kurdistanê û bidestvehatina beşeke zaf ji maf û azadiyên demokratîk ji bo netewa Kurd, bi tewahî rewşeke cuda ji her 3 parçeyên din ên Kurdistanê, li wir pêk hat. Di vê navberê de rewşa jinên Kurdistanê Îraqê jî hewcehî bi şirovekirina zêdetir heye. Lê em li vir naçin ser vê mijarê.

Bindestbûna netewa Kurd li beşên din ên Kurdistanê anku Kurdistanê Turkiyê, Sûriyê û Îranê, bi vê wateyê nine ku civaka kurdî yan partî û sazîyên siyasî û sivil ên Kurd di wan beşên Kurdistanê de, girîngiyê bi rol û beşdariya jinên Kurd di pêvajoya xebata siyasî, azadîxwazî û çalakiyên sivil û.. di civakê de nadin.

Peyama Yekîtiya Jinên Demokrat Ên Kurdistanê Îranê, Derheq 26^ê Sermawezê, Roja Pêşmergeyên Kurdistanê

Roja 17^ê Çileyaya Pêşîn a sala 1945'an, binkeya leşkerî a rejîma Paşatiyê li bajarê Mehabadê, ji aliyê xelkê şoreşvan û welatperwer yê vî bajarî hate girtin û

çekkirin.

Bi kiriyara han nîşan û cihwarên herî dawî ên rejîma Şah, li paytexta Kurdistanê hate komkirin û ala pîroz a Kurdistanê hate hildan, lewra PDK Îranê jî bo rêzgirtin derheq xebat û berxwedana Pêşmergeyên Kurdistanê, roja 17^ê Çileyaya Pêşîn di sala 1984'an de, weke **Roja Pêşmergeyên Kurdistanê**, diyarî kir. Di wê demê ve heya niha hemû salekê roja han bi rêz û hurmet ve tê pîrozkirin.

Ger mirov şoreşên azadîxwaz ên neteweya Kurd li hemû parçeyên Kurdistanê di 60 salên borî de mêze bike, derdikeve holê ku hêzên Pêşmergan bingeha berxwedan û sembola berxwedaniya şoreşên han bûye.

Di çanda siyasî û diroka azadîxwazî a netewa Kurd de, tu peyvek weke peyva pîroz a



Em bi başî dizanin ku jin di her perçeyê Kurdistanê de li gor rewşa siyasî, aborî û civakî a civaka Kurdî, xwediyê roleke jar û kêmrang e û gellek bihagiraniyê bi rola jinên Kurd di pêvajoya pêşveçûna civakê nehatiye dan. Di vê navberê de rola partî û rêxistinên siyasî, gellek berçav û çarenivîssaz e. Divêt partiyên Kurdî ji bo beşdarîkirina jinan di warê jiyana siyasî û civakî û...de pêşeng bin.

Girîng eva ye ku partî û sazîyên Kurdî heya çî qasî bi awayekî piratîkî ji bo vê pirsê hewlê didin û rê ji bo beşdariya jinan di meydana siyasî de xweş dikin, vedikin.

Emê li vir îşare bi bernamê û pîrensîpên yek ji partiyên Kurdistanê Turkiyê bikin ku di rastî de pêşengê partî û sazîyên Kurdistanê Turkiyê ye ji bo beşdarî û çalakkirina jinan di nava refên xwe de.

Partiya Civaka Demokratîk (DTP), yek ji partiyên Kurdî li Kurdistanê Bakûr e ku bi awayekî legal li Turkiyê tekoşînê dike. Partiya Civaka Demokratîk bi armanca çareserkirina pîrsa Kurd li Kurdistanê Turkiyê û dabînkirina maf û azadiyên netewa Kurd û jî bo demokratîkkirina Turkiyê xebatê dike.

Pêka bernamê û pîrograma hundirîn a vê partiyê, divêt Serokên vê partiyê du kes

bin(hevserok). Yek ji wan mêr û yek ji wan jî jin be. Biryara han weke pîrensîpek di nava bernamê û pîrograma hundirîn a vê partiyê de hatiye pejirandin û tê birêvebirin.

Em dikarin bibêjin ku pîrensîpa han, gavek demokratîk û nûjen e ku xizmetek mezin derheq çareserbûna doza jinên Kurdistanê Turkiyê dike. Herwiha xizmetek e ji bo gehîştina netewa Kurd bi azadî û demokrasiyê.

Partiya Civaka Demokratîk a Turkiyê ku îsal jî di hilbijartinên Perlemana Turkiyê de beşdarî kir, karî 23 nûnerên kurd bişîne Parlemanê ku 8 kes jî wan nûneran jin bûn.

Herwiha heyamekê beriya niha Partiya Civaka Demokratîk li bajarê Amedê, duyemîn Kongreya Awarte a xwe pêk anî. Di wê kongirê de rola ektîv û beşdariya eleng a jinan, bala mirovan ber bi aliyê xwe ve dikîşand.

Di nava 878 nûnerên kongirê de nivî jin bûn. Herwiha li nava 80 kes jî nûnerên kongirê ku ji bo Civata Birêveberiya Partiya han hilbijartin, hejmareke zaf jin bûn.

Jinên weke **Emîne Ayna, Sebahat Tüncel, Perwîn Boldan, Selma İrmak, Aysel Tuglok, Fatma Kurtolan, Sewahîr Bayindir, Gülşen Kışanak, Mizgîn Birgat, Şilan Emiroxlû** û... di Şewra hilbijarî a Partiya Civaka Demokratîk de tîn xuyakirin.

Di vê kongireyê de Nûredîn Dîmîrtaş bû Serok û xatûna Selma İrmak, bû Hevseroka wî (seroka duyem).

Hêjayê gotinê ye ku hejmarek zaf ji wan şaredariyên Kurdistanê Turkiyê ên ser bi Partiya Civaka Demokratîk ku jî rêya hilbijarînan vê karîne serkevin, jin in.

Di nava kongireya yekem heya duyem a vê partiyê de, Aysel Tuglok, jina xebatkar a Kurd weke Hevseroka Ehmed Turk, hatibû hilbijartin ku piştî hilbijartina Serok û Hevserokên nû ên vê partiyê, her du serokên berê bi germî pîrozbahî ji serokên nû kirin ku ev yeka gavek nûjen û demokratîk e ku divêt gellek kes dersê jê wergirin.

netewa xwe û berevanîkirin ji nasnameya netewa xwe, amade ye ku jiyana xwe bike goriyê vê rêbazê.

Eva di halekê de ye ku Pêşmergeyên Kurd û netewa Kurd qet hez li şer nekiriye û hez jî nakin, belku tenê ji bo parastina Kurdistanê û berevanîkirin tevî hêzên dagirker ên neyarên welatê xwe, dest avêtine çekê.

Em di vê rojê de pîrozbahîya xwe ji gişt Pêşmergeyên dilê û welatparêz dikin. Herwiha cihê xwe ye ku di roja han de pîrozbahî û destxweşiyê ji wan hemû keç û jinên Kurd bikin ku bi lixwekirina kincên pîroz ên Pêşmergeyê, diroka xebata netewa Kurd herdem zindî ragirtine.

Em weke YJDK Îranê li welatê Swêdî, serbarê tewandina serê rêz û hurmetan li hember xebat û cangoriyên Pêşmergeyên Kurdistanê, bi dil pîrozbahîya xwe ji gişt Pêşmergeyên Kurdistanê dikin û hêvî dikin ku di pêşerojê nêzîk de 17^ê Çileyaya Pêşîn û gişt rojên pîroz ên din di Kurdistanê azad û avadan de bê pîrozkirin.

Silav li gişt şehîdên Pêşmerge û malbatên serbilind ên şehîdan

Silav li gişt girtiyên xweragir û malbatên erbilind ên wan

Silav li netewa xebatkar û dilê a Kurdistanê Yekîtiya Jinên Demokrat ên Kurdistanê Îranê li Swêdê



Pêşmerge cihê xwe di nava dilê xelkê de ne vekiriye û rêz û hezkirinê komên xelkê ber bi aliyê xwe ve nekêşaye.

Pêşmerge kesek e ku herdem tevî vê çendê ku seh bi nebûna mafên netewa xwe dike, gihiştîye vê rastiyê jî ku tenê sehkirina vê yekê bes nine û hewce ye di vê pêxemê de di çepera herî pêş a xebatê de cihê xwe bigire.

Pêşmerge ji bo bidestveanîna mafên berheq ên

Roja Cîhanî A Xebat Li Dijî Îdzê û Rewşa Vê Nexweşiyê Li Îranê

Sureya Obeyd, berpîrsa Beşa Nifûsa Cîhanî a ser bi Rêxistina Neteweyên Yekbûyî, di peyamekê de bi hinceta yekê Çileyay Pêşîn "Roja Cîhanî a xebat

li dijî Îdzê", ragihand: Her rojê 5700 kes li cîhanê bi sedema tûşbûn bi nexweşiya Îdzê jiyana xwe ji dest didin û 6800 kes jî tûşî nexweşiya han dibin.

Dr. Elîrîza Sîtayêş, berpîrsê bernameya hevbeş a Rêxistina Neteweyên Yekbûyî derheq nexweşiya "HIV"yê li Îranê, tevî "Radio Farda"yê ragihand: Lêkolîna herî dawî a derheq nexweşiya Îdzê li Îranê, sal û nîvek beriya niha hate ragihandin. Li gor vê lêkolînê 66 hezar kes di Îranê de tûşî nexweşiya "HIV"yê bûne.

Wezareta Saxlemî a rejîma Komara Îslamî a Îranê di serhejmarîyekê de ku di dawîya sala 2006'an de, belavkirin, ragihand ku 14 hezar kes li welatê Îranê tûşî nexweşiya Îdzê bûne û eva jî di halekê de ye ku **Dr. Ehmed Kûşa**, Cîgirê berpîrsê saxlemîya zanîngeha Zanîstên Nojdariyê a bajarê Tewrêzê eşkere dike ku her niha 100 hezar kes li Îranê tûşî nexweşiya Îdzê bûne.

Pêka rapora Nûçegihanê "ISNA"yê, çend salan piştî peydabûna vîrûsa Îdzê, yekemîn kesê tûşbûyî bi nexweşiya Îdzê li Îranê ku zarokê kêm temen bû, hate naskirin. Ev zarok jî rêya lédana xwîna nepaqîj ve tûşî nexweşiya han bibû.

Piştî jêrdeçûna asta hejmara kesên tûşbûyî bi madeyên sirker, hejmar û asta kesên tûşbûyî bi nexweşiya Îdzê jî ber bi jor de çû. Herwiha hejmarek ji karnasên vê nexweşiyê, li



ser vê baweriyê ne ku di van salên borî de hejmareke zaf ji kesên Îdzî li Îranê jî rêya tûşbûyî zayendî ve tûşî vê nexweşiyê bûne.

Karbidestên rejîma Komara Îslamî a Îranê li destpêka peydabûna vê nexweşiyê li Îranê, bê liberçavgirtina sedemên navxweyî ragihandin ku mifah wergirtin ji xwîna pîs û nepaqîj bûye sedema jordeçûn û berfirehbûna nexweşiya Îdzê di Îranê de.

Berfirehbûna îtiyadê li Îranê, bi sedema girîngînedana berpîrsên rejîma Komara Îslamî a Îranê bi vê pîrsê, bi taybetî li encama siyasatên dijî mirovî ên rejîmê, li wan herêmên ku neteweyên din tê de dijîn, bûye sedema jordeçûna asta kesên tûşbûyî bi nexweşiya "HIV"yê.

Ji 5 Kesan, Kesek Xwendin û Nivîsandinê Nizane

Rêxistina Çand, Perwerdehî û Zanistî ya Neteweyên Yekbûyî (UNESCO) ragihand ku li

seranserê dinyayê ji her pênc kesên kemilî, yek kes xwendin û nivîsandinê nizane.

Li gor rapora perwerdehiyê ya salane ya UNESCO'yê digel newekheviya mezin li dinyayê di hejmara zarokên ku diçin dibistanê, bilindbûnek heye, lê xebatên ji bo bilindkirina asta xwendin û nivîsandinê bi tîra xwe nehatiye kirin.

Raporê ragihandî ye ku li dinyayê mafê xwendin û nivîsandinê, mafê herî bîngêhîn e. Di civîna Neteweyên Yekbûyî ya di sala 2000'î de li Dakarê 164 hikumetan biyara perwerdekirina kesên kemilî girtibû bin ewlehiyê, lê ev soz bi cih nehatiye.

Di raporê de hikumetên ku li hemberî mijarê pejinkar tevnegeriyane, tîne rexnekirin, di heman demê de diyar

kiriye ku jin bi qasî mêran ji xizmetê perwerdehiyê sûdê wernagirin.

Her wiha hate ragihandin yê ku xwendin û nivîsandinê nizanin li 15 welatan dijîn û ji van welatan jî 8 welatên ku serjimariya wan pir e ev in: Bangladeş, Çîn, Brezîlya, Misir, Hindistan, Endonezya, Nijerya û Pakistan.

Dîsa hate gotin ku di sala 1999'an de hejmara zarokên ku diçûn dibistana seretayî, 647 mîlyan bû ev hejmar di sala 2005'an de derketiye 688 mîlyonî.

UNESCO'yê bi taybetî xwest ku hevkeşeya di navbera zarokên keç û kur ên ku diçin dibistana seretayî divê bê sazîkirin û got ku ev pîrsgirêka hevkeşeyê zêdetir

li welatên Erebb û li Başûr û Rojavayê Asyayê heye. Ji bo welatên Afrîkayê jî hate gotin ku ew bi tîra xwe amûrên xwendin û nivîsandinê nikarin bi dest bixin.

Tîrsa veguhestina vîrûsa Îdzê ji aliye kesên tûşbûyî bi madeyên sirker heya astekê ye ku **Dr. Gilave Musteşarî**, karnasa Payebilind a Rêxistina Neteweyên Yekbûyî, derheq kêmkirina asta mifahwergirtin ji madeyên hişber di vê derbarê de dibêje: Tê texmînkirin ku 3 hezar zarokên tûşbûyî bi nexweşiya Îdzê li Îranê jî dayîk bibin.

Pisporên warê nexweşiya "HIV"ê, rola ragihandinê bi giştî û televîzyonê bi taybetî li agahkirina xelkê derheq pêşgirtin ji tûşbûn bi nexweşiya Îdzê û belavbûn û jordeçûna asta wê, gellek girîng hesabandin. Lê **Dr. Ebas Sedaqet**, berpîrsê Îdareya Îdzê a Wezareta Saxlemîya Îranê di hevpeyînekê de tevî malpera dewletî a "Aftab"ê ragihand ku medya û ragihandinên rejîma Komara Îslamî a Îranê bi giştî û nemaze televîzyonên vê rejîmê, qet girîngiyê nadin vê nexweşiyê û di pirogiramên xwe de gellek bi kêmi bas ji vê nexweşiyê e egerên tûşbûn bi nexweşiya han dikan.

Hewildan ji bo çareserkerin û pêşgirtin ji berfirehbûna nexweşiya "HIV"ê, erkê gişt dewletên xelkî û berpîrs e. Lê pêka hindêk nûçeyan, dezgeh û binkeyên ewlekarî ên rejîma Komara Îslamî a Îranê li bajarên Kurdistanê, mijûlê birêvebirina pîlanên cur bi cur ji bo tûşkirina ciwanên Kurd bi nexweşiya Îdzê ne. Rejîm di vê pêxemê de jin û malbatên tûşbûyî bi nexweşiya "HIV"ê li bajarê din ên Îranê ber bi bajarên Kurdistanê şandîye ku weke mînakên herî dawî em dikarin îşare bi anîna çend malbatên Îdzî bo bajarê Ciwanroyê bikin.

Çavkanî:

Malpera "Iranpressnews"

Radio Farda

Pêşmergeyekî PDK Îranê, Di Kêbirkêya Hilatinê De Pileya Yekem Bi Dest Xist



► Li gor agahiyên Navenda Nûçeyan a PDK Îranê, di pêşbirkêyê hilatinê de ku roja 07.12.2007'an, di parêzgeha Mûsilê a welatê Îraqê de birêve çû, **Rehîm Ehmedpûr**, yek ji pêşmergeyên werzişvan ê Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê, karî pileya yekem destve bîre.

Hêjayê gotinê ye ku qirare li meha Şibata 2008'an, maratoneke 42 kîlometrî, li Herêma Kurdistanê Îraqê, were birêvebirin û **Rehîm Ehmedpûr** û **Faxir Mewlûdî**, du werzişvanên girûpa werzişî yê Komarê ne ku di heyamê 5 salên borî de bi berdevamî di kêbirkêyên bajar û parêzgehên Kurdistan û Îraqê de beşdarî kirine û çendî serkevtinên berçav bidestveanîne

WÊJEYA CÎHANÊ

ADAR JIYAN

adarjiyan@mynet.com



Wêje, wekî berhemên xurt ên ku bi mebesta derbirîna hest û hizrên ku mirov têr dikin û çêj û têrbûneke şahîk û têrwate didine mirov tê

navandin. Ango, wêje çeq û hevsela ber û berhemên ku gihîştine radeyeke berz û payedar e.

Rast e; wêje, wekî derbirîna hest û hizrên mirov tê zanîn û ravekirin. Belê tenê ne derbirîna hest û hizrê; her wisa hunera derbirîna hest û hizrê û vegotina bi bandor û manîdar e jî. Digel vê yekê, her gotin û vegotinê devkî an jî tekst û derbirîna nivîskî her gav nikarin di bergeha ber û berhemên wêjeyî de cihê xwe bibînin.

Nîqaş û guftûgoyên ku der barî wêjeyê de hatine destpêkirin, xwe dispêrin yewnaniya kevna. Ev nîqaş û dubendiyên ku wêjeyê rave dikin, bi du awayan derdikevin pêş. Yek jê, şîroveya ku wêjeyê di sînorekî deng û asê de diesrîne û wê wekî formeke qalibgirtî nîşan dide ye. Ya din jî, ya ku wêjeyê wekî berhemên resen ku bê sêwirandin, bi azmûn û ceribandînan salan re pêk tîne, nîşan dide ye. Bi kurtayî mirov dikare bibêje ku du nêzîktêdayînan bingehîna ên ku berên tekstên wêjeyê didin ber lêpirsînê hene.

Gelek çeşnên wêjeyê hene.

1. Helbest
2. Pexşan
3. Dram(dilşewatî)
4. Birên vegotinê yên din

Tevgera ku bi şewaze cihêreng dexma xwe li dîroka wêjeyê dide wekî t4ebgera wêjeyê tê binavkirin. Di dîroka wêjeyê de gelek tevger û livbaziyan mezin pêk hatine.

Gava ku mirov dêhna xwe dide tevgerên pêşketinê, pêşî hemû bi wêjeyê dest pê kirine. Û hemû jî xwe dispêrên ber û berhemên bîrdozên ku bastûra jiyana civakî pêk anîne. Hizr û felsefeya ku bîrdozên civakî pêk anîne, gelek caran xwe li ser huner û wêjeyê jî dane ferzandin. Û ev ferzandin bûye hem bingeha tevger û livbaziyan hunerî hem jî rîkn û rîpinê ber û berhemên wêjeyî.

Wêjevan, bi nêrîna û nêzîkahîtdanên nûjen re gelek guherîn û veguherînên nû pêk tînin û pergala civakê serobin dikin. Wêje, berî nivîsê jî hebû. Belê bi dahênandina nivîsê re hem vegotina nivîskî û hem jî ya devkî pêş ve dibe. Dîroka mirovahiyê ya nêzîk bûye govanê(şahidê) gelek rêbaz û livbaziyan wêjeyê. Hin jê ev in:

1. Romantîzm (coşdarî)
2. Kevnareyî/kevnepî (klasîzm)
3. Siruştîparêzî (naturalîzm)
4. Şayesîparêzî (parnasîzm)
5. Sembolîzm
6. Mengîwerî (îdealîzm)
7. Rasteqînî (realîzm)
8. Futurîzm
9. Dadaîzm
10. Surrealîzm (gerçeküstücülük)
11. Letrîzm (tîparêzî)
12. Egzistansiyalîzm

13. Personalîzm (xweperestî)

Em ê di vê nivîsara xwe de li ser çar tevgerên wêjeyê rawestî û bi kurtayî rave bikin.

1. Kevnareyî/kevnepî (klasîzm)

Di dawîya sedsala 17'yan de li Fransayê derketiye holê. Mijar û babeta xwe ji mîtolojiya yewnaniya kevna wergirtiye. Ji bo vegotinê zimanê zikmakî wekî bingeh dibîne. Bi fersaeta "huner ji bo hunerê" tevdiqere. Wêjevanên vê tevgerê, kesantiya xwe vedîşêrin. Di berhemên wan de tîpolojîya şexsiyetên kevnepî derdikeve pêş. Ji bo wê, cih û wargeh zêde be girîng e çimkî cih û war guherbar in. Zimanê ku tê bikaranîn, bijarte (zimanê kesên bijarte) ye. Vegotin sade û xwerû ye.

Mirov dikare berhemên Descartes û Molire wekî mînak nîşan bide

2. Romantîzm (coşdarî)

Di dawîya qirnê 18'yan û destpêka qirnê 19'yan de li erdemîna Ewropayê derketiye holê. Bêtir li Ingilîsatan û Almaniyayê şax vedaye. Welatê Fransa û Ewropaya Başûr hinekî bi derengî nasdarî vê tevgerê bûne. Ev tevgera wêjeyê, li hemberî wêjeya Klasîk wekî bertekekê(reaksiyonekê) derketiye holê. Romantîzm, li hemberî hemû astengiyên ku azadiya mirov manî dikin, radiweste. Felsefeya xwe jî "rêzana herî baş bêrêzanî ye" wergirtiye. Bi daxwaza derbirîn û pêkanîna d hest û hizrên mirov ên ku derbasî jiyana dibin, tevdiqere. Serkêşê vê tevgerê yek jê Victor Huga ye.

3. Siruştîparêzî (naturalîzm)

Siruştîparêzî, di dawîya qirnê 19'min de li Fransayê derketiye holê. Nivîskarên siruştîparêz, li hemberî tiştên camidî/heyberî derdikevin. Di berhemên xwe de dijwariya jiyana derdixin pêş. Û hemû reşbînî û nakokiyên civakî derdixin pêş. Nemaze jiyana kesên xizan û belengaz, xizanî û belengaziya mirovan deprêş dikin. Bandora civakê ya li ser takekes wekî hêzeke diyarker dibînin. Romana Emile Zola ya bi navê Le Roman expérimental (Romana Ceribîner) a ku di 1880'yî de nivîsiye ye ji bo vê tevgerê mînak e.

4. Dererastîparêzî (surrealîzm)

Piştî herdu şerên cihanê (şerê yekemîn û duyemîn), li erdnîagariya Ewropayê derketiye holê. Wekî tevgerê nê, li hemberî rasteqîniyê, tiştên derîaqil vedibêje û diparêze. Nivîskarên ku vê tevgerê diparêzên, liv û bizavên hişmend û derhişmendiyê didin ber hev û li gorî xwe piroleiyêke(mubelexeyêke) dûrîaqil diafirînin. Nivîskarên vê tevgerê yên mîna Andre Breton, Louis Aragon, Benjamen Peret û hwd. gelek berhemên xurt afirandine. Îro di nav nivîskarên dinê ên nivîsê nû de gelek nivîskarên vê tevgerê îhane û digihên. Pirên wan jî bi mîzahê(pêkeniyê) tîkildar in.

Em ê di rojên pêş de li ser cureyên wêjeyê yên din jî rawestî û bbi kurtayî tevgerên nû li gorî qaîdeyên wêjeyê rave bikin.

Kaniya Helbestan

MIRIYÊ ZINDÎ

Xizan Şilan -Stockholm

di neynika dilê xwe de
li nav qermîçokên
eniya xwe
pêrgî jana xerîbiyê tîm
pîra hêviya min
ya li navbera berbangê
û asoyê
hilweşandin
toza bîranînê
lanet bûyî
bi kefa mistan
bi ser min de
daweşandin
mayînê bagêje
di mêjiyê min de
teqandin
nikarim xwe ji pencên
kurtepîsta zimanê deyûzan
biparêzî dayê
çavsofî
hesûdî
û zikrepiya mirovên çeqel
bîr û baweriyê
li min diqirînin
jiyanek zindî mirî
li min sîwar kirin
di jiyana talanbûyî
û gîyanê xwe de
bû me qulîngê koçeber
ji ber awirên bermok
hesta tawanbariyê
û evîndariyê
bêhn li min diçikê
pîst li min xûz dibê
di nav êp
hêrs û tîrs
û bédengiya xwe de
dîfetîsim
wekî ku ez ne ji te
ji zikê janê çêbû bûm
êpan
bi awirên zexelane
ez ji paş ve
xençer kirim
hevsarê xemgîniyê
xistin stûyê hêviyên min
û pêwqa fanosa
pêperojî min
li min tefandin
dayê
ez niha
ji piyala hesretkêpan
keserkêpan
û serxwepan
hêstîrên dilê te
vediwim
û her roj
bi zindîbûna xwe re
dimirim
li ber dîwarên
kolanên hinavê min
yên bînavnîpan
kêlê gora min datînin

2005-06-09

Stockholm

Malbata Cemîl Paşa Diyarbekirî û Dr. Qasim Miqdad Cemîl Paşa

Konê Reş

Çendî min dixwest ez jî beşdariyê di **Festîvala Rêzgirtina Neteweyî bo malbata Cemîl Paşayê Diyarbekirî li Hewlêra paytext**

bikim, lê mixabin ji ber gelek sedeman, ew derfeta zêrîn bi dest min neket.. Erê derfetek zêrîn bi ji bo min. Min di dixwest enamên vê malbata dêrîn ji nêzik ve nas bikim û bi taybet li Kurdîstana azad. Tevî ku ez gelek neferan ji wan nas dikim, bi taybet ewên ku li Binxetê dimînin. Di vê dema dawî de, min du hevpeyvînan xweş bo KurdistanTV amade kirine. Yek bi **Jala xanim**, keça Ekerm beg Cemîl paşa re ye û ya din bi **Mistefa beg**, kurê Mihemed begê Cemîl paşa re ye. Belê navê min di progirama festîvalê de hebû û kêfxweş dibûm ku bi mamoste **Malmîsanîj, Dr. Kendal Nezan, Perwîn xanim, Verda xanim** û yên mayî re, têkevim dabaşa malbata Cemîl Paşa Diyarbekirî û em bi hev re kar, xebat û bizava wan di ber kurdewariyê de giftûgo bikin.. Lê mixabin **sînor** bû kelem û ew derfeta zêrîn ji dest min firiya.

Xwendevanên bi rûmet! Nivîsara jêr de hatî, mijara min bû ji bo festîvala rêzgirtina neteweyî bo malbata Cemîl Paşayê Diyarbekirî li Hewlêra paytext. Min Dr. Qasim Miqdad Cemîl Paşa wek mînakek ji vê malbatê ji xwe re hilbijartibû, kerem kin hûn û nivîsara min.

Ji nav van çend malbatên dêrîn ku li bajarê Amedê, heyamê çend sed salan li wî bajarî dijîyan, weke malbata: Zulfî Zade, Birincî Zade, Hacî Îbrahîm Efendî(1) û Cemîl Paşa, ji tevan zêdetir malbata Cemîl Paşa di nav Kurdan de bi nav û deng e û navê bajarê Diyarbekirê, bedena diyarbekirê bi navê wan ve hatiye girêdan û naskirin. Him jî malbata han di warê xebata Kurdperweriyê de hatiye naskirin, nemale bi wan mirovên xwe yên xebatkar û Kurdperwer weke: Omer Cemîl Paşa, Qedrî Cemîl Paşa, Ekrem Cemîl Paşa, Wecdî Cemîl Paşa û hinên din.

Cemîl Paşa, nevîyê Mehmûd Paşa bû. Ji bav û kalên xwe ve li bajarê Diyarbekirê dijîya, lê bi koka xwe ji xelkên Silopîyê ne. Ji ber vê yekê Qedrî Cemîl Paşa, di bîranînên xwe de xwe bi naznavê (Zinar Silopî) daye naskirin. Ji berî 300 salî ve Beden û Birca Diyarbekirê dibin hêza destê vê malbatê de bû, yekî dispart ewê din ku heta dawîya wan Cemîl Paşa û kurên xwe bûn.

Di sala 1847 de, piştî ku sultanê Osmanî, mîrê Cizîra Botan, mîr Bedirxanê Azîzî, dîl û sirgûnî Stenbolê û girava Kirtê kir, hingê berê xwe da Kurdan û bi sed hezaran ji Kurdan koçberî derdora Anadolê kirin. Cemîl Paşa jî li Yemenê kir walî hetanî ku ji şer û belaya wî xelas bin û kesên wek Cemîl Paşa nedin ser şopa mîr Bedirxan, ji ber ku têkiliyên Cemîl Paşa û mîr Bedirxan

bihev re hebûn û herêma Diyarbekirê bêtir di bin destê Cemîl Paşa de bû û wiha Cemîl Paşa 30 sal li Yemenê qedand. Li Yemenê Cemîl Paşa 8 jinên din bi ser dotmama xwe de anîn, ji wan jinan 11 kur û 3 keç jêre çêbûn, 4 kur û keçek ji dotmama wî û 7 kur û 2 keç ji wan jinên din.

Piştî ku Cemîl Paşa 30 salên xwe li Yemenê derbas kirin, vejeriya welatê xwe Diyarbekir û gellek zêr û mal bi xwe re anîn û kurên xwe bo xwendin û zanîne şandin, nemale jî Stenbol û Ewropayê. Wî di sala 1900'an de, li bajarê Diyarbekirê xatira xwe ji gelê xwe xwest û çû ber dilovaniya xwe.

Di dawîya sed salên 19 û despêka 20'an de, kurên Cemîl Paşa di nav rewşenbîrên împatoriya Osmanî de, ji yên sereke dihatin hejmartin, him jî pir têkiliyên wan bi malbatên Kurdperwer li Diyarbekir û Stenbolê re hebûn..

Li piştî ku destûra 1908'an hate deranîn, kurên Cemîl Paşa jî bi welatparêzên Kurdan ên wek: Bedirxaniyan, Baban û Şemdinan, xebat û bizav kirin, da ku navê gelê Kurd wek gelên Yûnan, Turk û Erebbilind bikin û wiha doza mafê gelê Kurd li Sultan kirin.

Di sala 1912'an de, Omerê Cemîl Paşa(2) tevî xwendekarên Kurd li Stenbolê, yekemîn komela xwendekarên Kurdan a bi navê " Hêvî " damezirandin, wê demê ew serokê komelê bû. Her wiya wî pêwendiyên dostane bi hin kesên gelên bin dest weke Erebb, Yunan û Ermenan re damezrand.

Lê niha em vegirin ser kurê Cemîl Paşa yê din Qasim ku dibe kalikê Dr. Qasim Miqdad. Qasimbeg ji kurên Cemîl Paşa yên mezin bû, camêr ne kêmi birayên xwe bû, belê ji giştan bêtir barê mabata Cemîl Paşa bi xwe ve hiltanî û di berde dixebitî. Dîwanxaneyay wî di bajarê Diyarbekir de, ji her çar dîwanxaneyên din bêtir bi mêvan û dan bû, him jî welatparêzekî dilêş û xemgîn bû.

Dema serok " Wilson " her 14 bendên xwe di sala 1917 an de li cîhanê belavkirin " Qasim beg " komelek Kurdî bi navê " Komela Tealî Kurdî " li bajarê Diyarbekirê ava kir. Bi alîkariya Kurdên welatparêz weke: Dr. Evdella Cewdet, Dr. Fûad Hac İbrahîmefendî û Memdûh Selîm Beg, wan tayvên wê li gellek bajarên rojhilatê vekirin. Him jî danûstandinek bi komelên Kurdî yên Stenbolê re çêkirin, hingê Qasim Beg hate bijartin ku ew li Stenbolê serokê komelê be. Lê ku em vegirin ser kurên Qasim Beg. Sê Kurên wî ên bi navên: Şemseddîn, Ekrem û Miqdad hebûn.

Şemseddîn: Li Siwîs, bajarê Lozanê, bi bira û pismamên xwe re xwendina xwe didomand. Dema ku şerê cîhanî yê yekemîn dest pêkir vejeriya Turkyê û beşdarî di şer de kir, hetanî ku di sala 1916 an de giha Dêrazorê û di wê salê de çûye ber dilovaniya xwe.

Ekrem: Wî tevî birayê xwe re li Lozan dixwend. Di destpêka şerê cîhanî de

vejeriya Stenbolê û tevî tevgerên Kurdan bû. Gellek kar di komeleyên Kurdan de meşandine.

Di sala 1919an de, bi mîr Celadet Bedirxan û birayê wî Dr. Kamran Bedirxan re, berî ku peymanê Sîverê di navbera hevalbenda û dewleta Osmanî de were mohrkirin, tevî Mecer Newêl yê Ingilîzî bona vê çendê ku daxwazên gelê Kurd nasbikin li Kurdîstana Bakur geriyane.

Di sala 1925'an de, pir têkiliyên Ekrem beg bi Şoreşa Şêx Seîdê Pîran re hebû. Bi hilweşandina şoreşê re, Ekrem beg li Stenbolê hate girtin û hukmê darvekirinê jêre hate dayîn, lê bi hêza zêran hate berdan..

Miqdad: Bavê Dr.Qasim, ji kurên Qasimê Cemîl Paşa yê biçûk bû. Dema şerê cîhanî yê pêşîn, herdu birayên wî û pismamên wî ji Ewropa vegriyan Turkyê, hingê rê ji ber xwendina wî li Ewropa hate birîn, vêca bavê wî, ew li Diyarbekir û Stenbolê şande xwendinê. Lê mixabin, vê dawiyê û bi taybetî piştî şoreşa Şêx Seîdê Efendî, cî û war li Turkyê ji ber wan hat girtin, wan jî baş famkir ku nikarin bi hêza zêran nikarin hikûmeta Mistefa Kemal Paşa bixapînin. Hingê jî, Mistefa Kemal paşa navê wan ji Cemîl Paşa guhertibû bi Cemîl Oglo, vêca ji neçarî Miqdad Beg bi birayê xwe Ekrem Beg û bi pismamên xwe re wek: Qedrî Beg (3), Mihemed Beg (4), Bedrî Beg (5), Wecdî Beg ... hwd, di Adara 1929 de, binxetî Sûriyê bûn.

Wiha tevî zarokên xwe, li bajarê Dirbêsiyê û Heseke kom bûn. Di wê navberê de, komela Xoybûn li Bêrûtê di sala 1927'an de hatibû damezirandin. Vêca tev bûn endamê wê komelê û xwe ji şoreşa Agrî re amedekirin ku ji sînorê Sûriyê ve êrîşî Tirkan bikin, lê mixabin ew armanca wan jî serneket. Di wan salan de eynê sala 1932 an xwedê kurek da Miqdad beg li bajarê Heseke, navî wî kir Qasim, li ser navê bavê xwe.

Dr. Qasim Miqdad Cemîl Paşa 1932 - 1992

Dr. Qasim, zarokatiya xwe heya temenê 8 saliyê li bajarê Heseke û gundê Tehlikê derbaskiriyê. Hingê bavê wî mala xwe barkiriyê Şamê, wiha wî xwendina xwe ya destpêkî, orte û bilind li Şamê bi dawî aniye. Etvî vê jî, hinî gellek zimanan bûye wek: Erebbî, Turkî, Franseyî, Ingilîzî. Ji bilî vê çendê ku zimanê Kurdî, zimanê axavtina mala wan bû.

Piştî ku xwendina xwe ya bilind di warê bijîşkiyê li zanîngeha Şamê de bidawî anî, vejeriya bajarê Derbêsiyê û li wir kilînkek vekir. Lê pir lê dom nekir û berê xwe da bajarê Qamişlo'yê. Di roja 7ê Adara sala 1963'an, li wir kilînkek vekir û bi şev û roj, êş û nexweşyên gelê Qamişlo û Cizîrê derman dikir. Bi wî awayî heyamê 28 salan li bajarê Qamişlo jîya, hetanî ku di roja

13.10.1992'an de, çû ber dilovanya xwe.

Di roja 14.10.1992'an de, li veguhastina termê wî ji bajarê Qamişloyê bo goristana gundê Dugirê, piraniya xelkê Cizîrê, bi Kurd, Erebi, Ermen û Siryan beşdar bûn. Termê wî li kêleka mezarê Dr. Ehmed Nafiz Zaza veşartin. Li ser gora wî çend gotin ji bo pesn û şarezayiya wî hatin xwendin. Di dawiyê gotinan de, Metran Antiranîk wiha got: "Dr. Qasim, sembola hevgirtina neteweyên Cizîrê ye.. Pîroz be ji wî gelê ku ew ji wan e."

Di çil rojiya wexera wî de, tev neteweyên Cizîrê, diyaritûn kesayetiyan hikûmetî û dost, heval û mirovên wî yên ku ji Şam û Helebê hatibûn, beşdarbûn. Li ser gora wî gellek gotin û helbest hatin xwendin.

Çima Dr. Qasim Miqdad bi vê rêxistina dûr û dirêj? Gelo ji ber ku bişîşkekî jîr û zana bû..?! Yan jiber ku ew ji malbata Cemil Paşayê Diyarbekirî bû?!

Vana bi tenê nebûn belku mirovahî, wekhevî û cangorîtiya wî bû.

Dr. Qasim, xwe di ser kesekî re nedigirt û kes jî di ser xwe re ne digirt, tucar rojek ji rojan esl û neseba xwe bi xwe re nekir paye. Tucar negot ku ez kurê Cemil Paşa me, tucar wî pişt bi paşnavê xwe (Cemil Paşa) nekir. Tenê bi navê Dr. Qasim Miqdad dihat naskirin.

Dr. Qasim, kes di ser kesî re negirt, tu ferq û cudahiyeke di navbera Kurd, Erebi, Ermenî, Siryanî, misilman û Fele yan Êzidiyan de nedidanî. Tev li bal wî wekhevîbûn..

Di şevên zivistanî de, cizme dixist lingê xwe û lişûn nexweşên xwe de diçû gundan û taxên dûrî bajêr.

Pere ji xizan û belengazan nedistand, belê gellek caran bihayê derman jî, ji bal xwe ve dida wan.

Mêr bû, ji kesî ne ditirsiya, ne ji Şêx û Qeşan û ne ji hêzên dewletê û piraniya wan pêre dost û hevalbûn..

Dr. Qasim egişt bû, li şûn malê dinê neçû, heke lişûn de çûba wê niha çend qonaxên wî hebûna. Ji ber vê çendê 28 salên xwe yên dawîn, di hotêla Semir Emîs tevî kurên Baho li bajarê Qamişlo derbaz kir.

Rast e jin ne anî û bê ku bedena wî şîr bibe çû ber dilovaniya Xwedê, wî jî ev yeka baş dizanî, lê wî tev nexweşên ku diçûn bal wî wek zarokên xwe diditîn û di piraniya wan de di dît ku tiştek ji billî çêkirina zarokan nayê. Çêkirina zarokan pêve, vêca pêwîst didît ku rêya tendiristiyê nişanî wan bide da ku di pêşerojan de saxlem bin û karibin tiştekî hêjayî xwe û yên derdora xwe re pêk bînin. Ji ber ku wî raman û xebata rast û dirust di beden û laşê saxlem de didit. Ne di yê nexweş de. Vêca dixebitî ku laşan saxlem bike, ne ku peran bi dehev wek doktorên îro.

Wiha di wê navberê de, jin jibîr kir û xwe di nav bera mirovhezkirin û mirovparêziyê de jibîr kir.

Dr. Qasim, pir jîr û zîrek bû. Çawa ku me got, di warê zansit û zanîne de, kêma kes li Sûriyê de mîna wî bûn. Mirov ne dizanî, Dr.

Qasim, bişîşe, yan dîrokzane. Kêma zêde di her warî de xwedî zanîn bû. Bi gotina dostên wî yên nêzik ku ji min re gotin: "Dr.

Qasim Miqdad ansîklopîdyake li ser dû lingan bû".

Dr. Qasim di warê Kurdîtiyê de ne çav girtî bû. Lê lişûn salixdanên tevgera Kurdan bû û di salên dawîn de hêviyên wî bi welatekî rizgarkirî pir mezin bû. Tiştê jê dihat xwestin dikir û Dida. Mirov dikare wî bixe rêza wan doktorên ku canê xwe gorî xaka Kurdistanê kirine wek: Dr. Evdula Cewdet, Dr. Fûad, Dr. Ehmed Nafiz Zaza û hinên din.

Bi baweriya min, mirovê ku dev ji jiyana xwe berde û jiyana kesên li dordora xwe xweş û geş bike, ew mirov mêre û çî mirovê ku êş û nexweşiyên xwe jibîr bike, bi êş û nexweşiyên xelkên li dora xwe ve bixebite, ew mirov giranmêr e, hêjayî pesn û şabaşan e.

Dr. Qasim, yek ji van giranmêran bû. Camêr jiyana xwe tevde diyarî gelê Cizîrê bi tev netewên ku têde dijîn kir. Qet rojek ji rojan li ola mirov ne pirsî, bi tenê berguhka wî di guhên wî de bû û destên wî janên nexweşan dihejmartin. Wiha bi jîr û zîrekiya xwe rapor û listeya dermanan ji nexweşên xwe re dinivîsandin. Pîrî caran nexweşên wî bi dermanên wan listeyan baş dibûn, bêtir ji dermanên listeyên doktorên Şam û Helebê yên bi teybetî. Sed rehma li gîyanê wî bîba re, bihişt cî û warê wî be..

Perawîz û jêder :

1- Dr. Fûad yê ku li Diyarbekirê bi şêx Seîd re hatiye bidarvekirin, kurê Haçî İbrahim Efendî ye...

2- ta roja îro zarokên Omerê Cemil Paşa li dervî Kurdistanê dijîn, nemaze li Edirne û Stenbolê wek: Dr. Farûq û Dr. Cemil û Kemal Sahib..

3 - Qedri Beg (Zinar Silopî): Di sala 1946 an de wê nûnerê Kurdên Binxetê çû Mahabadê bo pîrozkirina Komara Demokrat, zarok jêre nebûn ew xalê Dr. Qasim bû.

4 - Mihemed Beg di dawiya sala 1992 de li gundê xwe (dade Ebdal) çû ber dilovanya Xwedê, nuha kurê wî Mistefa Beg li eynê gund dimîne, nêzikî Serê Kanyê

5 -Du kurên Bedrî Beg li Sûriyê dimînin yek Dilawer e, derman xaneyek wî li Helebê ye, yê din Welîde li Şamê akenciye.

6 - Qedriyê Cemil Paşa (Zinar Silpî) - Doza Kurdistan (biranîn) Erebi

7 - Dr. Celîlê Celîl: Nehdet elekrad elseqafiye we elqewmiye 1984- bi Erebi

8 - Kamîran Haco, dîrok û şax û paxên dara malbata Cemil Paşa ji devê Dr. Qasim girtibû û nivîsibû, tev dane min ..

9 - Di herdû salên dawîn de tîkilyên min bi Dr. Qasim re hebûn, pirê caran min jê dipirsî li dor malbata Cemil Paşa, wiha ez serwextî gelek nûçeyan bûm.

Li Qesra Pirtûkan Ya Kanzelsberger A Bajarê Pragê Konferansê Li Ser Naveroka Pirtûka Dr. Yekta, "Ez Îfade Didim" Pêk Hat



Dr. Yekta û Mîna Qasimlo

▶ Roja 11.12.2007'an, li Qesra Pirtûkan ya Kanzelsberger a bajarê Prag paytexta Komara Çekê, konferanseke mezin û berfireh li ser nixandina naveroka pirtûka "Ez Îfade Didim" a Dr. Yekta Geylanî (Uzunoglu) û "Petr Zantovsky" pêk hat.

Konferansê ji aliyê berpirsiyarê Qesra Pirtûkan ya Kanzelsbergerê "Filip Tomas" ve hatibû amade û organîzekirin. Di konferansê de "Petr Zantovsky" - rojnamevan û nivîskarê pirtûkê -, Serokê Saziya "Charta 77" - ku Şoreşa Qedîfe ya sala 1989'an pêk anîbû - "Prof. Frantisek Janouch", Serokê "Helsinki Komitee"yê Dr. "Libuse Silhanova", Dr. Yekta Uzunoglu - wek nivîskarê pirtûkê - û "Marek BENDA (Parlamentêrê Partiya Rast ku îro di desthilatê de ye) Serokê Komîsyona Edaleta Parlamentoya Çekê wek şîroveker çî girtin.

Di nav mêvanên konferansê de Serokê PEN'a Çekê, "J. Dedecek, Cihgirê Serokê PEN'a Çekê "J. Stransky, Cihgirê Serokê PEN'a Çek "Jana Cervenkova" û dehan siyasetvan, nivîskar, rojnamevan û kesayetiyan payebilind hebûn. Keça şehîdê nemir Dr. Qasimlo, Mîna Qasimlo jî beşdar bû.

Serokê Komîsyona Edaletê ya Parlamentoya Çekê, rêzdar Maerk BENDA bi awayekî vekirî soz da ku di nav van çend rojan di Parlamentoya Çekê de komîsyonek taybet ji bo lêkolîna naveroka vê pirtûkê were sazkirin û tev partiyên siyasî ên ku di Parlamentoyê de ne, di vê derbarê de yekdeng in.

Seroka "Helsinki Komitee"yê Dr. "Libuse Silhanova" - hevsera Profesora Dr. "Venek Silhan" - ku mamostayê Şehîd Dr. Qasimlo bû - di gotara xwe de got: "Em gelê Çekê serhişkiya ku li hember bêheqiyê nayê gotin û nakeve ber rayan, ji Dr. Qasimlo û Dr. Yekta Uzunoglu hîn bûn. Gelê me qerdarê van her du kesayetiyan Kurd e ku em hînî serhildanê li hember bêedaletî û neheqiyê kirin. Divê her zarokek Çekî di Dibistanê de vê pirtûka giranbiha bixwîne û jiyana birûmet nas bike."

Di konferansê de aliyên cuda cuda ên pirtûkê hatin nixandin û beşdaran jî dîtî û rayên xwe anîn ziman.

Amerîka Daxwaza Çareseriya Aştiyane Ya Pirsra PKK'ê Dike

Dîl Deylî, Şêvirmendê Wezîra Derve ya Amerîkayê ragihand ku welatê wî bi tu awayekê li gel çareseriya leşkirî de nine û li gel çareseriya aştiyane ya pirsra PKK'ê de ye.

Wî da zanîn ku ew him li nava Tirkîyê û him jî li nav Îraqê de tevî rêya leşkirî ninin û dixwazin pirsra han bi rêya siyasî were çareser kirin.

Herweha got ku rayedarên Îraqî û Herêma Kurdistanê bi başî rê ji ber gihîştina alfkariyên madî bi PKK'ê girtine û sinorên xwe konterol dikin.

Dîl deyî zêde kir û got ku PKK jî li



gel çareseriya serbazî de nine û daxwaza çareseriya siyasî dike. Bo minak jî îşare bi azadkirina ew 8 serbazên tirk yê êxsîr ji aliye PKK' ve kir û ew gav bi girîng hesaband.

Li Elwaca Urmîyê Kurdekî Biemr

Hecî Salih Renberî, Xelkê şehreka Elwacê ser bi bajarê Urmîyê li Kurdistanê Îranê ye.

Ew îsal di 117 saliya xwe de dijît. Hecî Salih li sala 1270'ê Rojî li gundê Aşk û Balûlana ser bi devera Tirgower a Urmîyê hatiye dinê. Paşan koçberî gundê Tezekend (Kaniqizanê) û dûre ji şehreka Elwacê bûye. Ew niha li şehreka Elwacê dijît. Hecî Salih bavê 6 kur û 4 keçan e herweha 89 nevi û 154 neviçirkê wî hene. Li deverê de mirovekî naskirî, oldar û mezin e, xwedî qedr û rûmetek zaf di nava gel de ye, gelek caran ji bo çareserkirina pirsên malbatî, eşîretî û karên xêr ji wî tê mîfah wergirtin.

Mirovek nexwende ye, lê bi başî dikare bixwîne, bi taybetî para herî zaf a demên xwe mijûlê xwendina quranê dike, herweha şehrezaiyek baş di karê şikestebendiyê (sinixçî) de heye, lê niha bi sedema kêmbûna hêz û qaweta xwe bi başî nikare wî karî encam bide.

Dema ku mirov diçe bal wî, ji meraq û



keyfxweşîyan nikare rabe û matmayî dimîne. Tûrikê wî teji ye ji serpehatî, bîranînên tal û şîrîn, şerê kurd û Ermenîyan, şerên çhanî yê yekemîn û duhemîn û ...

Hêjayî gotinê ye ku Hecî Salih niha jî li ser xwe ye û dikare bibîne, bibihîze û li ser lingê xwe jî bimeşe. **Amadekar: Selîm**

Di şeva yekem De Serê Jina Xwe Birrî

Li gorî Puk media yê, li devera Şerqîye ya Misrê de mêrek di yekem şeva çûne bal hevsera xwe de, ew bi boxtana wê ku keç nine û jin e, serjêkir.

Dema ku çiranên nêzik bi bûyerê guh ji çîjeqîja jinê bûn ku daxwaza hevkarîyê dikir, çûne cihê bûyerê û mêze kirin ku Hoda ya 23 salî li sokirê de hatiye serjêkirin.

Hodaya bûk li nexweşxaneyê de berî wê ku rih bide ji çiranên xwe re eşkere kirbû ku mêrê wê ew kare kiriye.

Her piştî bûyerê, polîsan tawanbar girtin û di lêkolînan de îtiraf kir ku ji ber wê ku li yekem şeva jiyana hevpar a xwe de nekariye bibe bi zawa û perdeya kiçniyê kun bike, û wiha fikiriye ku ew keç nine û têtîliya neşerî bi kesekî din re hebûye, lewre ew kuştîye.

Kurdeka 20 Salî 4 Zarok Bi Hev Re Anîn

Avesta- Jineke 20 salî ya Kurd ji Batmanê 4 zarok bi hev re anîn. Jina bi navê Fehîme Omğan, 3 keçik û lawek

anîn dinyayê.

Doktor û pisporên jinan dibêjin ji nava milyonek jin, li Tirkîyê de jinek 4 zarokan bi hev re û di carekê de tîne.

Zayîna bi rîya sezaryenê di bin çavdêrî û kontrola Dr. Ehmed Yalînkaya de çêbû. Giraniya bebikan



di navbera 1 kilo û 900 gram û 2 kilo û 300 gram de ye.

Bavê zarokan Mehmet Omğan, ku bi xwe jî Batmanî ye, Kurdekî bêkar e û tu dahatek wî ya xwedîkirina malbatê tune ye.

Dr. Yalînkaya got rewşa dayîkê û zarokan gelekî baş e.

Zîrveya YE'yê Morala Tirkîyeyê Xerab Kir

► **Mijara endametiya Tirkîyeyê a bo Yekîtiya Ewropayê neket rojeva zîrveya serokên dewletên YE'ê li Brukselê. Ev yek bû sedemê nerazibûna dewleta tirk.**

Encama zîrveya serokên dewletên Yekîtiya Ewropayê (YE) hate eşkerekirin. Ne endametî û ne jî beşdarbûna Tirkîyeyê ya bo YE'ê di danezana zîrveya YE'ê de cih negirt. Tirkîyê ev helwesta YE'ê wek bêhiqûqîyek binav kir.

Tirkîyeyê weke her gav, îcar jî Fransa tawanbar kir û berê xwe da Serokkomarê Fransayê Nicolas Sarkozy û got: "Sarkozi dixwaze endametiya Tirkîyeyê bo YE'ê bloke bike."

Serokwezîrê Tirkîyeyê Recep Tayyip Erdogan teselî da raya giştî ya Tirkîyeyê û got: "Pêvajoya endametiya YE'ê didome, divê kes senaryoyên karesatan ji xwe re nede çêkirin.

Netkurd